Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ jimar :754 21-Nîsan- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Mirov vekişiyan malan, heywan daketin qadan



Heywanên ku mirovan beşeke zêde cinsê wan qetil kirine, di dema şewba Covîd-19'ê de daketin bajarên vikîvala.
Ji ber pêkanînên mayina li malê mirov ji kolanan vekişiyan. Ji Parîsê heta Dêrsimê gelek heywan daketin kuçe û kolanan. Wîçewîça çûkan zêdetir bû.
Li Dêrsimê ji ber ku park û baxçe vala ne, pezkovî bi keriyan daketin qadan.
Li Parîsê jî werdek ji parkan derketin û daketin qadan. Polîsan werdek parastin û ti ceza li wan nebirîn. Li herêma Valde Marneyê jî du xezal daketin bajêr û mirovan dîmenê wan girtin.
Li welatê Galê jî bizin li ser peyarêyan geriyan. Li Îspanyayê jî Teyrên Tawis ji ser dîwarê parka Retîro daketin navenda paytextê.
Li kolanên Lophûrî ya Taylandê jî meymûn daketin kolanan. Hin dîmenên wan hatin weşandin, di dîmenan de tê dîtin ku bi sedan meymûn şer dikin. Li gorî gelek rojnameyan ji ber ku ji klanên cihê ne, meymûnan ev şer kirine. Lê ji ber birçîbûnê neçar mabûn ku werin ba hev.
Li Japonyayê jî ji ber ku mirov vekişiyan malan, tu kes neçûn Parka Narayê û xezal daketin kolanan.
Li bajarê Barselona ya Katalonyayê jî beraz daketin kolanan, polîsan xwestin berazan dûr bixînin.
Li Fransayê berazan êrîşî zadan kirin, gelek walîyan jî bi awayekî îstîsna destûra nêçîrê dan.
Li bajarê Chîcaco ya DYE'yê akvaryûma Sheddê deriyê xwe ji ziyaretvanan re girt û pengûen li nava avahiyê geriyan. Li West Odaklana Kalîfornayê jî elok daketin qadan.
Li Santîagoyê ya ku paytexta Şîliyê ye, pûmayekî ciwan hate dîtin.

# Tîma Rojava ya fotbulê beşdarî pêşbirka tîmên herî popular ên li Avusturya dibe

Ji ber belavbûna Koronvîrusê tevahiya çalakiyên werzîşê li cîhanê rawestiyan. Bi armanca pêşkêşkirina destekê û teşwîqkirina tîman Yekitiya Werzîşê ya Avusturya Ligalportal hilbijartinek ji tevahiya tîmên futbolê yên li welêt çêkir. Di nav de tîma Rojava heye, da ku tîma herî popular û hezkiriyên wê pir in nas bike. Piştre wê xelatên cuda ji tîmên ku dengên herî zêde bidest bixin belav bike.




Tîma Wezîrê ya Avusturya ya Ligalportal li ser malpera xwe, linkek ji bo dengdayînê diyar kir, da ku heya 31`ê Nîsanê deng bidin tîmên tev li hilbijartinan bûne. Di nav de tîma Rojava. Endamên tîmê penaberên Sûriyê ne. Di gelek maçan de bi serket û di nav tîmên werzîrê li Awropa de pêştinek baş bi dest xistiye.
Tîm di 2016`an de bi desteka komeleya Kurd li Viyanayê ava bû. Tîm ji komek ciwanên Rojava yên Kurd, Ereb û Suryan ên ku ji herêmên di demên cuda de penaber bûne û li Avusturyayê bicih bûne pêk tê.
Di sala 2018`an de tîm bi ji hêla Yekitiya Wezîrê ya Avusturyayê ve hate erêkirin û awayekî fermî tev li turnuvaya fermî ya Avusturya bû.

# Ihtimala jiyanê ya li gerestêrka Kepler-1649c'yê

**Tê gotin yek ji gerestêrka (exoplanet) ku ji hêla NASA'yê ve li derveyî Pergala Rojê hatiye keşfkirin Kepler-1649-c ji gelek aliyan ve dişibe cîhanê û ji ber vê dibe ku mirov bikare lê bijî.**

**Lêkolînên NASA'yê yên bi amûra fezayê Kepler kirî 2018'an bidawî bû. Amûra fezayê li ser 2 hezar û 681 exoplanetê lêkolîn kir, li gorî encama van lêkolînan li derveyî Pergala Rojê li Kepler-1649-c'yê îhtîmala jiyanê heye.**



# 'Em ê li gundê xwe bin û heta ku sax bin emê jê hezê bigirin'


Jinên gundê Maşoqê derbarê jiyan û hevgirtina di gundê xwe de anîn ziman û gotin, heta dawî emê bi gundê xwe ve girêdayî bin. Lewre gundê me vegera eşqa axê ye, hezkirina mirovan û hevgirtinê ye. Em di vê jiyanê de pir westiyan, lê tama xweşbûna wan rojan hebû. Emê li gundê xwe bin û heta ku em bijîn emê jê hezê bikin."

Li Rojavayê Kurdistanê her ku demsala biharê tê, gundên wê bi xweşikbûna erd û kulîlkan dixemile. Li gundan tevgereke cuda heye mirov tê de bi xweza û rehetiyê re dijîn, her wekî din hevgirtin û hezkirina di navbera şêniyên gundan de pir qayim e. Mînaka wê jî gundê Maşoq yê ku15 km li bakurê navçeya Tirbespiyê ye. Jimara şêniyên gund nêzî 147 malbatî ye. Gundê Maşoq navê xwe ji çîrokên evîndara girtiye û weke ku tê gotin du aşiq li ser erdê wê gihane hev û navê wê ji hingê ve Maşoq e. Gundê Maşoqê bi bilindbûna gir û dirêjiya kaniyên xwe tê nasîn. Gundekî bi xwezaya xwe pir xweş e û bi dilnizmiya şêniyên xwe watedar e. Di gundê Maşoqê de du kanî hene kaniya jin û kaniya mêran jê re dibêjin. Her wiha piraniya malên wê ji kevirên reş û kelpîçan hatine lêkirin, heya niha bi wê xweşikbûna xwe maye. Jinên gundê Maşoqê derbarê jiyan û hevgirtina di gundê xwe de axivîn û çîrokên xwe yên jiyanî ji me re parve kirin.



Dayika bi navê Şemsa Hecî Mehmûd li ser jiyana xwe ya di gund de axivî û wiha got: "Ez li gundê Maşoqê hatime dinê. Niha temenê min 74 e. Min jiyaneke pir xweş di vî gundî de derbas kiriye. Dema em zarok bûn, dayikên me digotin yên ku li gundan dijîn weke ku ji xwe re buhiştek li ser erdê heye. Me watedariya wan axaftinan fêm nedikir. Heta ku em mezin bûn. Gundê me pir xweş e, hewaya wê paqij e, kaniyên wê zelal in û axa me jî dewlemend e. Di nava vê jiyanê de me nexwestiye em rojekê ji vî gundî derkevin. Her xweşiya ku mirov lê bigere di vir de heye. Dibe nifşên niha ne di ferqa qîmeta vê yekê de bin. Jiyana li gundan vegera eşqa axê ye, hezkirina mirova ye û hevgirtinê ye."

# Duran Kalkan: Hewl didin ewleyiya Qendîlê ji holê rakin



Duran Kalkan diyar kir ku DYA û dewleta Tirk hewl didin ewleyiya Qendîlê ji holê rakin, ji bo vê jî ji PDK'ê dixwazin li wê deverê baregehan çêke. Kalkan diyar kir ku vê yekê qebûl nakin û ev plan wê bibe sedema şer. *R-2*

# PDK'ê li 2 deverên din ên herêma Soran jî hêza xwe zêde kir

Piştî ku PDK'ê hêzên xwe şandin Zînî Wertê, derket holê ku PDK'ê hêzên xwe yên li Babîşka û Qesrê yên herêma Soran jî zêde kirine. Li gorî îdiayan di nava pêşmergeyên şandîn herêma Soran de, endamên Pêşmergeyên Roj jî hene. *R-2*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ jimar : 754 21-Nîsan- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Hunermendan bang li aliyên siyasî kir: Dûrî planên dijminên gelê Kurd bisekinin

112 hunermend û nivîskarên ku piraniya wan ji Başûrê Kurdistanê ne, derbarê aloziya li Zînî Wertê de daxuyaniyek dan û hişyarî dan aliyên siyasî ku ji nêzîkayiyên xizmeta planên dijminên gelê Kurd, dûr bisekinin. *R-7*



# "Pêşmergeyên Roj" li Zînî Wertê çi dikin?

*Ji bo parastina gelê Kurd "Pêşmerge hatin" ev durişmên bi vî awayî li ser dîwarên bajarê Dêrikê hatin xêzkirin. Lê rastiya wan, roj bi roj eşkere dibe. Piştî êrîşên ser Xanesorê, ev koma behsa mijarê êdî ber bi Qendîlê ve diçe da bi riya hin partiyên li başûrê Kurdistanê planên Tirkiyê pêk bînin.* *R-5*



# Platforma Jinên Kurd: Ji bo Kurdan roja yekîtiyê ye

Platforma Jinên Kurd a Yekgirtî got, "Roj roja yekîtiya Kurdan û xurtbûnê ye. Divê Kurd neyên xapandin." *R-3*



# Arêz Ebdullah: Di dema şerê DAIŞ'ê de me hewara xwe gihand Qendîlê

Endamê Serkirdayetiya YNK'ê Arêz Ebdullah di hesabê xwe yê Facebook'ê de nivîsek belav kir û tê de wiha got; "Di dema şerê DAIŞ'ê de em çûn Qendîlê û me daxwazî kir hêzên gerîla ji bo Kerkûk, Hewlêr û deşta Nînowa werin şandin. Divê em ewqas kor û bênanûxwê nebin." *R-4*



# Bihayê genim hat diyarkirin

Şirketa Pêşxistina Civaka Çandiniyê bihayê radeyên din ên berhema genim ên werza îsal, eşkera kire. Desteya Aborî û Çandiniyê ya herêma Cizîrê jî diyar kir ku ji bo parastina werza çandiniyê di dema dirûtinê de, gelek tedbîr girtine. *R-6*

# Rêveberiya Xweser derbarê girtiyan de daxuyanî da

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê derbarê girtiyên birîndar û nexweşiyên kronîk ên ku dema bidawîbûna hikumê wan nêz bûye daxuyaniyek da.

Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) roja 4'ê Nîsanê bi civîneke çapemeniyê avakirina komîteya şopandina dosyaya girtî û revandiyan ragihand. Erka komîteyê rewşa tevayiya girtî û revandiyên li gel tevayiya aliyên Sûriyê bişopîne. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê der barê mijarê de daxuyaniyek nivîskî da.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin:"Ji însyatîfa ku Meclisa Sûriya Demokratîk ragihandiye, li ser banga Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî (Antonio Guterres) û Nûnerê Taybet ê ji bo Sûriya (Geir pederson) ya derbarê berdana girtiyên li gel tevayiya aliyên Sûriyê de ya ji ber xeteriya pandemiya Koronayê li ser jiyana girtiyan, ji ber ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi qanûnên navdewletî û mafên mirovan girêdayî ye ku êşa Sûriyan sivik bike, Hevserokatiya Meclisa Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê lîsteyek navên girtiyên xwedî exlaq, baş e, birîndar û nexweşên kronîk ên ku dema bidawîbûna hukmê wan nêzîk bûye amade dike da ku berde."

## PDK'ê li 2 deverên din ên herêma Soran jî hêza xwe zêde kir

Piştî ku PDK'ê hêzên xwe şandin Zînî Wertê, derket holê ku PDK'ê hêzên xwe yên li Babîşka û Qesrê yên herêma Soran jî zêde kirine. Li gorî îdiayan di nava pêşmergeyên şandîn herêma Soran de, endamên Pêşmergeyên Roj jî hene.

Aloziya li devera Zînî Wertê piştî bicihkirina hêzên PDK û YNK'ê dest pê kiribû, didome. Li vê herêmê çêkirina baregeheke nû berdewam dike. Hikûmeta Herêma Kurdistanê diyar kir ku Wezareta Pêşmergeyan hêz ji ber virûsa koronayê ya nû (Covid-19) şandine herêmê. Lê gelek derdor û çavdêrên siyasî jî dibêjin ku ev yek rê li ber zêdebûna êrişên dewleta Tirk a dagirker vedike.

KCK'ê jî bi daxuyaniyekê bang kiribû ku hêzên hatine herêmê vegerin qadên xwe û nebin sedema aloziyeke di navbera Kurdan de.

Wezareta Pêşmergeyan têkildarî mijarê daxuyanî dabû û diyar kiribû ku wan ew hêz ji ber vîrusa korona û demkî şandine herêmê. Lê li aliyê din sewqiyata leşkerî ya ji bo herêmê berdewam dike. Hemwextî daxuyaniya Wezareta Pêşmergeyan pêr êvarê hêzeke nû ya Zêrevaniyê ku girêdayî PDK'ê ye, sewqî Zînî Wertê hate kirin.

Rojnewsê ragihand ku çavkaniyên pêbawer ên ji herêmê ku bi sedema ewlekariyê nexwest navên xwe eşkere bikin, diyar kir ku PDK ne tenê li Zînî Wertê, li 2 deverên din ên herêma Soran jî hêza leşkerî zêde dike. Çavkaniyan ragihand ku PDK'ê hejmara hêzên xwe yên li Babîşka ku dikeve navbera Diyana û Rewandizê, zêde kiriye û li wir liv û tevgereke zêde ya leşkerî heye.

Çavkaniyan got PDK'ê li herêma Qesrê ya girêdayî navçeya Soranê ku nêzî Qendîlê ye jî hejmara hêzên xwe yên li baregehan zêde kiriye.

## Li Hewlêrê xwepêşandanên li dijî desthilatê



Li Hewlêrê ya Başûrê Kurdistanê dikandar daketin qadan û banga vekirina dikanan kirin.

Bi sedan dikandar li Hewlêrê daketin kolanan. Xwepêşandêran xwest ber bi avahiya bajarê Hewlêrê ve biçin lê hêzên ewleyiyê rê li pêşiya wan girtin. Dikandaran banga sivikkirina tedbîrên qedexeyê û careke din vekirina dikanên xwe kir.

Hêjayî gotinê ye ku piştî li gelek parêzgehên herêmê vîrusa koronayê berbelav bû, desthilata herêma Kurdistanê biryara girtina sûkê da, her wiha ji nîvê Adara borî ve qedexeya derketina derve ferz kir û bi hemû awayan kombûn qedexe kir.

## Cenazeyên 2 şehîdan li Hesekê hatin veşartin

Malbat û hevalên şehîd Mecd Nezal Mehmûd û şehîd Zibêr Hemdîn Hemo cenazeyên her du şehîdan li Goristina Şehîd Dijwar a Hesekê spartin axê.

Cenazeyê şehîd Mecd Nezal Mehmûd (Kosovî) ku di encama nexweşiyê de şehîd bûbû û cenazeyê Zibêr Hemdîn Hemo (Goran Hesekê) ku di şerê Berxwedana Rûmetê yê li navçeya Serê Kaniyê de şehîd bûbû, ji Meclisa Malbatên Şehîdan a Hesekê hatin girtin.

Merasîma veşartina cenazeyan bi beşdariya malbatên her du şehîdan û hin endamên Meclisa Malbatên Şehîdan a Hesekê li dar ket. Malbatên her du şehîdan li gorî biryara Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya qedexeya derketina derve, tev geriyan.



Her du şehîd bi durişma "Şehîd namirin" spartin axê.

## Duran Kalkan: Hewl didin ewleyiya Qendîlê ji holê rakin



Duran Kalkan diyar kir ku DYA û dewleta Tirk hewl didin ewleyiya Qendîlê ji holê rakin, ji bo vê jî ji PDK'ê dixwazin li wê deverê baregehan çêke. Kalkan diyar kir ku vê yekê qebûl nakin û ev plan wê bibe sedema şer.

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Duran Kalkan derbarê aloziya li Zînî Wertê ya Hewlêrê de ji Medya Haber TV'yê re axivî.

Duran Kalkan têkildarî sewqiyata leşkerî û çekên giran a li Zînî Wertê hişyarî da PDK'ê û diyar kir ev hewldan, sedema şer e. Kalkan têkildarî aloziyê got: "Ev planek e û bi arastekirina DYA û dewleta Tirk pêk tê û ewlehiya Qendîlê ji holê radike. PKK vê yekê qebûl nake, eger pevçûnek rû bide jî divê bê zanîn ku sedema wê em nîn in."

Kalkan diyar kir PDK'ê di sala 2019'an de jî hewl daye bi heman şêweyê li herêma Biradost û Xinereyê baregehan çêke, lê piştî hişyariyan helwesteke berpirsane serwer bûye û gav bi paş ve avêtiye. Kalkan diyar kir ku niha careke din dixwazin planeke êrişê pêk bînin.

Duran Kalkan destnîşan kir ev rewş dê ewlekariya Qendîlê têk bide û ji ber vê jî hişyarî da PDK'ê û got: "Çêkirina baregehekê li Wertê sedema şer e û sedema wê jî ne em in."

Her wiha Duran Kalkan diyar kir ew hêvî dikin ku PDK dest ji vê hewldanê berde û da zanîn ku ev plan hemû bi daxwaza DYA û dewleta Tirk pêk tên.

## Li Qamişlo welatiyek ji ber Koronavîrusê mir

Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyaniyek ji raya giştî re parve kir.

Di daxuyaniyê de hat gotin, Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) ragihand ku kesek ji bajarê Hesekê (53) li nexweşxaneya Wetanî ya bajarê Qamişo ya di bin kontrola hikûmeta Sûriyê de ji ber Koronavîrusê jiyana xwe ji dest da.

Desteyê diyar kir ku rêxistinê di rapora xwe de destnîşan kir ku ew kes 22'yê Adarê bi vîrusê ket û derbasî nexwexşaya taybet hat kirin. Di 27'ê Adarê de ji bo nexweşxaneya Wetanî ya bajarê Qamişlo hate veguhestin, Di 29'ê Adarê de nimûmeya wî nexweşî şandin Şamê û roja 2'yê Nîsanê jiyana xwe ji dest da. Piştre encamên testên derket ku bi vîrusê ketiye.

Desteya Tenduristiyê anî ziman ku Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê ji belavbûna Koronayê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berpirsyar e. Ji ber ku agahî neda aliyên têkildar ên Rêveberiya Xweser, tevî ku dizane ku hikûmeta Sûriyê bi cidiyet bi Rêveberiya Xweser li hemberî vîrusê hevkariyê nake.

## Li Eyn Îsa û Girê Spî bîlançoya êrîşên mehekê

Dewleta Tirk a dagirker qada dagirkeriyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi erêkirina DYA û Rûsyayê berfirehtir kir û her çend Neteweyên Yekbûyî (NY) bi sedema Koronavîrusê (Covid-19) banga agirbestê kiribe jî, êrişên xwe bê navber bedewam dike.

Di meha Adarê de êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirk û çetyên wê yên li dijî Eyn Îsa û Girê Spî û Til Temır, Zirgan bê navber dewam kir. Şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û Meclisa Leşkerî ya Suryanî li ser esasê parastina meşrû besiv da êrişan û êriş hatin têkbirin.

Di êrişên dagirkerî û komkujiyê de cihwarên sivîlan yekser hatin hedefgirtin û navendên leşkerî yên hêzên hikumeta Sûriyê û Rûsyayê jî ji êrişan para xwe girt.

Her çend hêzên Rûsyayê û yên artêşa hikumeta Sûriyê jî hatin hedefgirtin, heta niha wan hêzan li dijî artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê tu bersiv nedaye. Şervanên QSD'ê û Meclisa Leşkerî ya Suryanî ku bi erka parastina Til Temirê radibin, parastina meşrû ya aktîf bê navber domand.

**JÎ QSD'Ê BANGA AGİRBESTEKE MİROVÎ**

Fermandariya Giştî ya QSD'ê di 24'ê Adarê de destnîşan kir ku wê ji ber Koronavîrusê (Covid-19) ku tevahiya cîhanê tehdît dike, di pozîsyona parastina meşrû de bimînin û banga agirbesta mirovî li hemû hêzên li Sûriyê kir. Lê belê dîsa jî dewleta Tirk û çeteyên wê êrişên li dijî herêmê berdewam kirin.

Di êrişên li ser Eyn Îsa û Girê Spî ya meha Adarê de hêzên dagîrker 18 caran êrîş kirin û hêzên xweparastina meşrû jî bersiv dan û di pevçûnan de 9 çete hatin kuştin, balafireke bêpîlot a dewleta Tirk hat xistin, erbeyeke ku çeka doçka li ser, hat îmhakirin. Di êrişan de sivîlek û şervanekî QSD'ê jî şehîd bûn.



# Hunermendan bang li aliyên siyasî kir: Dûrî planên dijminên gelê Kurd bisekinin

112 hunermend û nivîskarên ku piraniya wan ji Başûrê Kurdistanê ne, derbarê aloziya li Zînî Wertê de daxuyaniyek dan û hişyarî dan aliyên siyasî ku ji nêzîkayiyên xizmeta planên dijminên gelê Kurd, dûr bisekinin.

Derbarê aloziya li Zînî Wertê de 112 hunermendan daxuyaniyeke hevpar da û daxwaziya bidawîkirina aloziyê li aliyan kirin.

Daxuyaniya hunermendan wiha ye:

"Weke em dizanin ev demeke alozî di navbera aliyên Kurd de belav bûye û zêdetir dibe. Em dizanin di zêdebûna vê aloziyê de heke rola berjewendiyên hizbayetî hebe, misoger e roleke dijminan û dagirkerên Kurdistanê di avakirina vê rewşê de heye. Lewma em weke komeke hunermendên Kurdistanê ku em xwe weke dil û wijdanê gelê xwe dizanin, li pişt vê rewşê plangeriyeke tirsnak a dijmin dibînin. Nexşeya vê plangeriyê



jî 'Siyaseta Kurd bi Kurd bidin kuştin e' ev jî di encam de şerê navxweyî, kavilkarî û jidestdana destketiyên gelê Kurdistan e. Diyar e dijmin û dagirkerên Kurdistanê di serî de jî rejîma faşîst a Tirkiyeyê û Îran vê plangeriyê bi armanca zêdetir serweriya xwe li ser Kurdistanê çêkin, jenosîd, enfalkirina xelkê Kurdistanê pêş bixin, çand û hunera Kurdî ji holê rakin pêk tînin. Bêguman eger rê li vê plangeriyê neyê girtin, wê gelê Kurdistan rastî qirkirin û komkujiyên mezin were.

Ji ber vê em weke hunermendên nîştimanperwer ên Kurdistanê aliyên siyasî yên Kurdistanê hişyar dikin ku pêwîst e, ji zêdetir alozkirina rewşê û rûdana şerekî bi xwîn ê navxweyî xwe dûr bixin. Nebin amûrê bicihanîna planên dijmin û dagirkeran. Nebin sedema enfalkirin û komkujiya li hember Kurdan, nebin sedema jenosîdkirina çanda me. Pêwîst e hemû aliyên Kurd vê bibînin ku yekane rêya serketin û bihêzbûnê yekîtiya neteweyî ya gel û yekrêziya aliyên siyasî ye. Divê vê rastiyê zanibin ku serketina aliyan di şerê navxweyî de nîne. Ya bi ser dikeve tenê plana dijmin û dagirkeran e. Yên têk diçin tenê aliyên beşdarî şerê navxweyî dibin, ên dibin qurbanî tenê gelê Kurdistan e.

Lewma em weke hunermendên navên wan li jêr hatine nivîsandin, dubare hişyar dikin ku di demeke nêzîk de dawî li vê rewşê bînin, bi têgihiştin, aqil û ruhê nîştimanperwerî tevbigerin. Rêz û hurmetê ji xwîna bi sedan hezar şehîdên Kurdistanê re bigirin. Berjewendiyên bilind ên gelê Kurd li ber çavan bigirin. Xwe ji her cure şer û rûdanên xwîna nav aliyan dûr bigirin. Êdî ber bi diyaloga nîştimanî û yekrêziya neteweyî gav biavêjin. Herwiha em daxwaziyê ji gelê xwe dikin ku bi hestyarî nêzî vê rewşê bibin. Rola xwe di şkandina planên dijminan de bibînin. Bi her awayî li dijî rûdana şerê kavilkariyê yê navxweyî bisekinin."

Mîsoger serketin û azadî di yekgirtin û stratejiya hevbeş a nîştimanî de ye."

## 'Em hewl didin li gorî cewhera mêzîka Kurdî tev bigerin'

Koma mûzîkê ya gerîla Awazê Çiya, albûma nû ya bi navê 'Botan' weke 'vegera li cewhera xwe' pênase kir û diyar kir ku bi rêya vê albûmê wan xwestine rabirdûyê bigihînin vê serdemê û paşerojê.

Dengê çiyayên azad Awazê Çiya bi albûma nû ya bi navê "Botan" ku ji berhemên herêma Botanê amade kir, hefteya derbasbûyî li platformên dîjîtal derket pêşberî guhdarên xwe. Ji formên Payîzok, Heyranok, Narînok, Delalî, Belûte û Dengbêjiyê stranên Seydik, Mendê, Mîranê, Rezgê Rezvan, Çiyayê Cûdî, Heyran Jaro, Narîna Minê, Hey Gulê, Êvarê, Xemik Talanê di albûma Botanê de hene.

Amadekariya albûmê ji sala 2017'an ve dewam dikir. Albûm li Hunergeha Ş. Zerdeşt bi aranjeya Mehmûd Berazî hate amadekirin.

Ji endamên Awazê Çiya Têkoşîn Cûdî, Argeş Delîla, Viyan Kiçî û Hedar Rûbar li ser albûma nû ji ANF'ê re axivîn.

**DIYARÎ ŞEHÎDÊN BOTANÊ HATE KIRIN**

Têkoşîn Cûdî diyar kir ku wan projeya albûma Botanê berê amade kiribûn û di sala 2017'an de dest bi karê wê kirin. Têkoşîn Cûdî got, "Dema ku projeyê dest pê kir li Bakurê Kurdistanê têkoşîneke mezin hebû. Di şexsê Mehmet Tûnç, Pakîze Nayir û Asya Yuksel de me ev albûm diyarî şehîdên berxwedana xwerêveberiyê ya Cizîr û Botanê kir."

Têkoşîn Cûdî got, "Armanceke din a vê labûmê jî ew bû ku ev parçeyên ji dîroka gelê me careke din bên gotin. Ji ber ku ev klam ji aliyê dengbêjên gelekî hêja ve hatin gotin û ji nifşan gihîştin nifşên nû." Têkoşîn Cûdî destnîşan kir ku ji bo parçeyên din ên Kurdistanê jî projeyên wan hene.

**STRANÊN HERÊMÊN DIN JÎ WÊ BÊN KOMKIRIN**

Têkoşîn Cûdî got, "Em komeke ku hem di nava şer de hem jî di nava hunerê de dixebitin. Lewma me xwest bi karekî bi vî rengî stranên hêja ji nû ve bistirên. Me ji herêma Botanê dest pê kir û em ê stranên xweser ên herêmên din jî bi vî rengî kom bikin. Projeyên me ji bo vê hene."

**'JI BO ME YA GIRÎNG EW BÛ KU EM LI GORÎ CEWHERÊ TEVBIGERGE'**

Têkoşîn Cûdî li ser armanca xwe ya ji albûma Botanê got, "Me xwest li cewhera xwe vegerin û wê ji nû ve pêşkêş bikin. Armanca me ew bû ku em bibin dengê berxwedana li Botanê, vê yekê bi zimanê gerîla pêşkêşî civakê bikin û dengbêjiyê, yanî cewherê pêşkêşî nifşên ciwan bikin."

Têkoşîn Cûdî destnîşan kir ku di her stran û berhemê de wan dest li cewhera stranê wernedane û hewl dane cewhera wê biparêzin.

**PROJEYEKE BERFIREH A JI BO TEVAHIYA KURDISTANÊ**

Endamekî Awazê Çiya Argeş Delîla jî got, "Ev proje projeyeke berfireh e. Projeyeke ku ji bo tevahiya Kurdistanê ye. Me ji herêma Botanê dest pê kir. Weke hevalên Botanî yên di nava komê de destpêkê me kir. Hevalên me yên ji herêmên din ên Kurdistanê jî karê xwe dikin" destnîşan kir ku wan cewhera çanda Kurd ji xwe re kirine esas.

**HEWLDANA KU RABIRDÛYÊ BIGIHÎNE VÊ SERDEMÊ Û PAŞEROJÊ**

Argeş Delîla destnîşan kir ku bi rêya albûma xwe xwestine rabirdûyê bigihînin vê serdemê û paşerojê û got, "Ji ber vê yekê berhema karekî berfireh e. Ev kar bi karê lêkolînê didome."

**DIVÊ ZEMÎNÊ ÇAND Û HUNERA NÛ ÇI BE?**

Argeş Delîla diyar kir ku ew ne di îdîaya dengbêjiyê de ne, lê hewl didin mîrateya dengbêjan veguherînin zemîneke çand û hunerê ya Kurdan. Argeş Delîla got, "Eger em karibin vê bikin, hingî muzîka Kurdî dema bê dikare gaveke xurt biavêje û ji rewşa xitimî rizgar bibe."

**DENGVEDANA ÇANDA KURD LI ÇIYAYÊN AZAD**



Endameke din a Awazê Çiya Viyan Kiçî got, "Bi navê zarokên Botanê em ji xwe ji nava vê çandê tên. Me xwest wê çandê bidomînin. Bi taybetî me xwest ev deng li çiyayên azad bilind bibe."

**BANGA XWEDÎDERKETINA LI ÇANDA XWE LI CIWANAN KIR**

Viyan Kiçî got, "Em bi dengê jinên Botanê Meryemxan, Nesrîn Şîrwan mezin bûn. Niha jî li Botanê gelek jin ên dengbêj hene. Em wan dişopînin. Ji bo me gelekî girîng e ku ev çand li çiyayên azad deng vede." Viyan Kiçî destnîşan kir ku ev çand divê teqez bijî û bê pêşvebirin û got, "Bi taybetî divê ciwan xwedî li vê mîrateyê derkevin. Ev dîroka me ye. Xaleke din a xwedîderketina li mîrateya xwe dikare ev be. Dem ew dem e ku ciwanên me li çand, ziman û dîroka xwe vegerin."

**'JIN ÊN KU ÇAND Û MÎRATEYA KURDÎ HILDIGIRIN'**

Ji Awazê Çiya Hedar Rûbar jî destnîşan kir ku yên çanda Kurd diparêzin û hildigirin jin in û got, "Ya rast ên ku herî zêde xwedî li dîrok, çand û mîrateyê derdikevin jin. Botan mînaka herî şênber a vê yekê ye. Di mijara veguhastina çand û mîrateya xwe ji bo nifşên nû de jinên Botanê xwedî cihekî cuda ne."

**'EM TEVGEREK IN KU LI SER KOKA XWE MEZIN DIBIN'**

Hedar Rûbar destnîşan kir ku Tevgera Azadiyê ya Kurd li ser koka xwe ava bûye, bi pêş ve diçe û got, "Em heta dawiyê dilsozê dîrok, civak û nirxên xwe ne. Em jî weke gerîla hewl didin temsîliyeta civaka xwe bikin."

# Ji şêx û rûspiyên Minbicê pêngava komkirina alîkariyê



Şêx û rûspiyên bajar û gundewarên Minbicê ji ber qedexeya derketina derve, ji bo malbatên hewcedar pêngava komkirina alîkariyan da destpkirin.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojihlatê Sûriyê ji bo rêgirtina li ber Koronavîrusê tedbîrên pêwîst girtin. Ji wan qedexeya derketina derve ye ku 23‘yê Adarê dest pê kir û hê jî didome.
Ev bandorê li kesên ku debara malbata xwe ji karê xwe yê rojane dikin kir.
Şêx û rûspiyên eşîrên bajarê Minbic û gundewarên wê destpêka vê mehê pêngava komkiririna alîkariyên ji bo malbatên hewcedar re da destpêkirin.
Derbarê pêngava komkirina alîkariyan a şêx û rûspiyên eşîrên Minbicê de, bi navê şêx û rûspiyên bajar û gundewarên Minbicê şêx Mihemd Elî Reşo spasiya Rêveberiya Xweser kir ku ji bo parastina tenduristiya welatiyan ji vîrusê dixebite, kolan û deverên giştî dezenfekte dike.
Mihemed Elî Reşo anî ziman ku însyatîfa şêx û rûspiyên eşîrên Minbicê ya komkirina alîkariyan ji pêwîstiyekî hat û got, “Gelek malbat debara xwe ya jiyanî bi karê xwe yê rojane dikin. Pêngava komkirina alîkariyan ji malbatên di rewşên wiha de bi alaqeyek mezin ji aliyê bazirganan ve hat nîşandan.”

## Bihayê genim hati diyarkirin



Şirketa Pêşxistina Civaka Çandiniyê bihayê radeyên din ên berhema genim ên werza îsal, eşkera kire. Desteya Aborî û Çandiniyê ya herêma Cizîrê jî diyar kir ku ji bo parastina werza çandiniyê di dema dirûtinê de, gelek tedbîr girtine.

Rêveberiya Xweser di 14`ê Nîsanê de civînek li dar xistibû û bihayê kirîna genim ji bo îsal bi 225 lîreyên Sûriyê diyar kiribû. Roja Şemiyê jî Şirketa Pêşxistina Civaka Çandiniyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê li cihê Desteya Aborî û Çandiniyê ya Herêma Cizîrê li bajarê Qamişlo, bihayê radeyên din ên genim diyar kir. Herwiha desteyê diyar kir ku ji bo parastina werza çandiniyê gelek tedbîr girtine.
Cîgirê Desteya Aborî û Çandiniyê ya Herêma Cizîrê Mehmûd Mihemed di daxuyaniya çapemeniyê de diyar kir ku bi hevkariya şaredariyên gel û Hêzên Ewlekariya Hundir ji bo parastina werza çandiniyê gelek tedbîr girtine ku yek ji wan reşandina dermanên giyayên bizerar li riyên hemû bajar û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê.
Mihemed destnîşan kir ku Desteya Şaredariyan ji bo derketina rewşên şewatê li herêmê, 60 erebeyên agirkuj amade kirine û dê li seranserî herêma Cizîrê bên belavkirin. Her wiha dê Hêzên Ewlekariya Hundirîn dewriye û nuqteyên xwe li rêyên bajar û navçeyên herêma Cizîrê, zêde bikin.

## Şaredariya Gel a Qamişlo dest bi dezenfektekirina ciyên sewalan kir

Hemleyên paqijyê û dezenfektekirinê dewam dikin.
Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo roja Şemiyê dest bi paqijkirin, dezenfektekirin û barkirina bermahiyên sewalên li xanên taxa Cimayê kir. Herwiha ji bo pêşîgirtina li Koronavîrusê û nexweşiya laşmanyayê ku ji ber bermahiyên sewalan çêdibe, tîmên dezenfektekirinê şandin wê derê.
Piştî ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 23`yê Adara borî de qedexeya derketina derve ragihand, Şaredariya Gel a Qamişlo ji 15`ê Sibatê ve dest bi paqijkirin û dezenfektekirina riyên sereke yên bajêr û çemê Ceqceqê kir. Hemle hê jî berdewam e.
Şaredariya Gel ji bo pêşîgirtina li Koronavîrusê (Covid-19) û nexweşiya laşmanyayê ku ji ber bermahiyên sewalan çêdibe, dest bi paqijkirin û dezenfektekirina riya sereke ya taxa Cûdî û taxa Cimaya û xanê sewalan kir. Piştî barkirina bermahiyan, tîmên dezenfektekirinê kolanên taxê dezenfekte kirin.
Hevserokê Komîteya Şaredariyan a kantona Qamişlo Mesûd Yûsif li ser mijarê wiha got: “Di vê demê de nexweşiya laşmanya çêdibe, lewra dê dermanê vê nexweşiyê bê belavkirin.”
Yûsif bang li şêniyên taxê kir û got: “Bi me re alîkar bin û gilêşê bi rengekî belave neavêjin. Bi vî rengî em ê bigihêjin encameke baş.”




## Li Şehbayê çandinî pêş dikeve

Hin malbatên efrînî yên ku ji ber êrişên dewleta Tirk û çeteyên wê koçberî herêma Şehbayê bûne, projeyek çandiyekê bi rê ve dibin ku salane bi sedhezaran şitlan derdixe.
Bi hezaran şêniyên kantona Efrînê ji ber êrişên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê neçar man, mîrasa bav û kalên xwe li pey xwe bihêlin û ber bi kantona Şehbayê ve biçin. Şênî dibêjin ku tekane rêya rizgarkirina Efrînê û vegera li warê xwe berxwedan e.
Şêniyên kantona Efrînê, li Şehbayê jiyana xwe ji nû ve bi rêxistin kirin û jiyan li Şehbayê zindî kirin ku di dema êriş û dagirkirina di her aliyan de wêran bibûn, bi taybet di warê çandiniyê de.
Bi mebesta geşkirina beşê çandiniyê li Şehbayê, hejmarek malbatên efrînî beriya du salan li kantona Şehbayê şitligeheke



ava kirin. Şitilgeh bi sed hezaran şil û gelek cûreyên çandiniyê berhem dide.

## PDK -YNK û siyaset



Medeni FERHO

Siyaset çi ye, yan jî polîtîke çi ye? Pirs yek e, lê bersiv du ne…
Parti ji bo siyasetê bikin tên avakirin. Her partî, bi distura “azadî zanebûn e” û “xwedî derketina li mîrateya gel” dest bi polîtîkê dike. Pêdiviya her partiyê bi zanista civakî û felsefê heye. Ji ber vê jî her partî, xwe wek “foruma çareseriya pirsgirêkan” dibîne, dixwazin civakek bi rûmet, têgihiştî, zana û bi îrade ava bikin.
Li çar parçeyên Kurdistanê jî partî hene û em dibînin ku, hin ji van partiyan, li gorî disturên ku me li jor destnîşan kirin siyaset-polîtîkê nakin.
Di van rojên ku vîrûsa korona dest daniye ser destîniya cîhanê û jiyana mirovahiyê felc kiriye, siyaset-polîtîka jî pûç kiriye; faşîzma dewşîrme, bi hemû hêza xwe û bi hêzên wek xeleka zincîrê girêdayî “organîze” êrîşan dike. Ji xwe totalîtarîzm jî ev e û wek xelekên zincîrê bi hevîdin ve girêdayî ne, makîneyek organîze ya suc e..
Balkêş e, Mussolînî ji bo totalîtarîzmê dibêje; “faşîzm, her tişt ji bo dewletê, li derî dewletê, ruhî û beşerî tiştek çênabe, nirx û bihayekî wê jî nîne, ji ber vê jî faşîst totalîter e”. Faşîzma dewşirme, ev sentez kiriye bingeha siyaseta xwe. Lê xelekên zincîrê organîze suc yên bi dewleta Tirkiyê re, ji nirxandina Mussolînî dur in. Ew tenê “evlad-ul ayal”in.
Çend sal in, em çavderiyê dikin ku, xelekên zincîra totalîterîzmaa Tirkiyê, yek çete ne, ya din jî PDK, piştre YNK ne. Çete li derî nirxandina Mussolînî ne, li PDKe û YNKe, partiyên siyasî ne, di nava federasyona Iraqê de xwedî statu ne. Statu tê wateya rêveberî, parlamento, burokrasî û hêzên çekdarî. Çete sergerde ne, lê PDKe û YNKe, eger îddîa dikin partiyên siyasî yên Kurdan e, nikarin bi vî rengî tevbigerin.
Bi taybetî PDK, wek cemaetek siyasî tevdigere. Benjamin Barber jî dibêje, siyaseta cemaetê, her dem bûye maşika destê hêzên dagirker. PDKe jî, mixabin, ji normên ku me li jor detsnîşan kirin e dûr e, ji siyasetê bêhtir, gel kiriye amurê karanîna berjeweniyan.
Gelo siyaset-polîtîka çiye?
Siyaset, gotinek erebî ye, ji gotina “seyîs”, hatiye çêkirin. Seyîs kesên li hespan dinêrin e. Tê wateya, timar kirinê, perwedekirin, rêvebirin, bi terbiye mezinkirin e. Intelijansiya Ereb jî ev gotin, di wateya hunerê rêveberî, bextewarî, perwerdehî û xwedî îradekirinê de bikar aniye. Her cure nivîsên li ser siyasetê jî, bi navê “siyastenamê” weşandine.
Polîtîke jî; ji gotina “polis-bajarsîte” hatiye çêkirin û gotinek Yewnanî ye. Tê wateya rêvebeirya bajêr. Aristo, di pirtûka bi nave “Politik” de, bingeha siyasetê danî ye. Di jiyana modern de, êdî desthilatdarî bi desturnameyan rêveberiyê dikin, ji bo gelê bextewar, xwedî helwesta îradî û têgihiştî ava bikin kar dikin.
Mixabin li Başûr ev kar û siyaseta ji bo vî karî nîne…
Bedewiyên çolîstanê ji seyistiyê, dewletên monarşîîk ava kirin, îradeyeke siyasî destnîşan kirin.
Mixabin li Başûrê Kurdistanê, ne bikêrî seyistiyê hatin, ne jî hunerê rêveberiyek modern nîşan dan, ne jî parastina statuya xwe ya siyasî kirin.
Niha jî, li hemberî Gerillayên ku di dema êrîşa çeteyên DAIŞê de çûne bi hawara wan nankoriyê dikin. NIha bûne xeleka zincîra totalîterîzma dewşirmeyên Turk-î Îslam û tevlî organize suc bûne. Di nava bêhanegiyek mixabinî de, ji Başûr, Bakur û Rojava dirêjî Libya bûn.
Niha jî PDKe, li Zinî Wertê û li Mexmurê, tevlî sucên organize yên faşîzma dewşirme bûye. Ne bi destê wan jî be, erênî û saloxadanên wan, Gerilla, niştecihên herêmê û welatparêzên penaber yên li Merxmurê hatin şehîd kirin. PDKe, bi dorpêça li Mexmurê jî bû kujerê zarokên di pêçêkê de.
Faşîzma dewşirmê nivîsa Kurdî qedexe kiribe jî, gelê Kurd, dîrok û xiyanetê ji bîr nakin, mînaka wê jî strana Mîrê Zirav e û hwd. ne!...
Divê gelê Başûrê Kurdistanê, rastiyê bibîne, ku PDKe û YNKe nikarin nunertiya gel bikin û xaka Başûrê Kurdistanê ji dagirkeran biparêzin.
Divê Gelê Başûr, weke salên 1975an, dîse li Zinî Wertê, raperînê bide destpêkirin, çawa rejîma Baasê qewirandin, hêzên dewşirmeyên faşîst ji herêmê biqewirînin û xeleka zincîra organize suc, ya PDK û YNKê jî parçe bikin.



# Platforma Jinên Kurd: Ji bo Kurdan roja yekîtiyê ye



Platforma Jinên Kurd a Yekgirtî got, “Roj roja yekîtiya Kurdan û xurtbûnê ye. Divê Kurd neyên xapandin.”

Platforma Yekîtiya Jinên Kurd, têkildarî êrîşên li ser gelê Kurd û komkujiya li ser Kurdan tê meşandin banga yekîtiyê kir. Platforêm ji ber vîrûsa korona daxuyaniyekr nivîskî weşand û xwet Kurd aştiya navxweyî mayînde bikin û wekî seferberiyê derfetên xwe parve bikin.
Platformê anî ziman ku Kurdistan di rewşeke zor û zehmet de derbas dibe û wiha got: “Kurdistan di bin dagirkeriya nijaperest, olperest û zayenperestiyê de ye. Di vê demê de dagirker şewba koronayê li dijî Kurdan wekî çekê dagirkeriyê bi kar tîne, alîkariya navxweyî asteng dike û civakê bêderfet dike, qetlîama jinan meşrû dike. Di heman demê de dixwazin tovikên neyartiyê jî di nava Kurdan de şîn bikin.
Platformê banga yekîtiya neteweyî jî kir û wiha bi dawî kir: “Em jinên Kurd bangî hemû sazî, dezgeh, rûsipî û rîsipîyên Kurdistanê dikin ku bila Kurd hevdu mihtacî dagirkeran nekin. Bila di vê dema dijwar de aştiya navxweyî mayinde bikin. Wekî seferberiyê derfetên xwe parve bikin.
Roj roja yekîtî û xurtbûna gelê Kurd. Divê Kurd bi fen û fûtên neyaran nexapin. Di vê roja teng de divê em hevdu ji dagirkeran biparêzin û bi hev re têkoşîna azadiya Kurdistsanê xurt bikin.

## Komîteya Aborî ya Jinan 17 hezar maske radestî şaneya aloziyê kirin



Komîta Aboriyê ya Jinan a bajarê Qamişlo 17 hezar maske bi armanca alîkariya kesên ku nikarin pêdiviyên tenduristî yên rojane yên li dijî Koronavîrusê bikirin, radestî Şaneya Aloziyê kirin.
Maske bi daxuyaniyekê li Navenda Heyva Sor a rewşên awarte ya bajarê Qamişlo hatin radestkirin. Di daxuyaniyê de endama Komîteya Aboriyê ya Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Armanc Mihemed got: “Wê mask li taxên Qamişlo bi rêya komînan bên belavkirin. Ev însiyatîf bi rêkxistina Komîteya Aborî ya giştî hat kirin.”
Armanc wiha dirêjî da axaftina xwe: “Me mask li ser hêzên leşkerî belav kirin û wê belavkirin berdewam be, hejmara maskên ku hatine çêkirin gihaşt 40 hezarî.”
Paşê hevseroka Heyva Sor a Kurd Cemîla Ehmed spasiya xebatkarên werşeyên Komîteya Aboriyê ya Jinan li ser vê însiyatîfê kir.
Bi belavbûna Koronavîrusê li gelek dewletan re, buhayên maskan li gelek cihan pir bilind bûn û bi dest nakevin.

## Meclisa Jinan spasiya xebatkarên parastina ji Koronayê kir

Meclisa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi peyamekê ku li ser malpera xwe belav kir, spasiya hemû xebatên warê parastinê ji Koronavîrusê kir.
Meclisê di peyama xwe de wiha got: “Saziyên Rêveberiya Xweser bi hemû tîm û komîteyên xwe yênê tenduristiyê, Heyva Sor a Kurd, Şaredarî û Hêzên Ewlekariya Hundirîn ji bo parastina welatiyan ji vê xeteriyê kar kirin û hîna jî dikin. Em spsiya van saziyan dikin û piştgiriya xwe bi wan radighînin ji ber



ku gelê me diparêze.
Em bang li welatiyan dikin ku bi aliyên têkikdarî re bibin hevkar da ku xeberiya vê pandemiyê dûrî bixin. Nemaze piştî ku rewşeke wefatê ji ber vîrusê li nexweşxaneya Wetanî ya bajarê Qamişlo derket.”

## Jinan li dijî qanûna înfazê çalakî kirin




Jinan di derbarê erêkirina qanûna înfazê de li ser hesabên medyaya dijîtal dest bi çalakiya, “Piştî Înfazê Jin di Metirsiyê de ne” kirin.
Di rojên derbasbûyî de li Desteya Giştî ya Meclîsê qanûna înfazê ya Tirkiyê bi raya wekîlên AKP û MHP’ê hat pejirandin. Bi erêkirina qanûnê re dest bi berdana nêzî 51 hezar girtiyên diz, çete û mafya hatin kirin.
Li ser hesabê Twîtter yê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) bi Heştaga “Piştî înfazê Jin di Metirsiyê dene” dest bi çalakiyê kirin.
Gelek jinan piştgirî dan çalakiyê. Bertekên jinan li ser torên civakî bi vî şêweyîne:
Wekîla HDP’ê Filîz Kerestecîoglu: Berî tehliyekirinê tê nirxandin ku wê ew bersûc ji bo jinan rîskê çêbikin ya na? Mafê jinan, cihên li ser vê mijarê pêwîstî bi serlêdanê heyî tên agahdarkirin? Çima ji bo jin xwe parastî hîs bikin daxuyaniyek nayê dayîn? Piştî înfazê jin di metirsiyê de ne.
Hevseroka KCD’ê û Wekîla HDP’ê Leyla Guven: Li cihê jin dema zarok were gotin wê çiqas masûn were dîtin mane? Ha xespkirin bi vî şêweyî tê birêvebiri. Piştî înfazê jin di metirsiyê de ne.
Wekîla HDP’ê Meral Daniş Beştaş: Me 7 roj û 7 şevan li Meclîsê got, Piştî înfazê jin di metirsiyê de ne. Wekî her mijarê ev mijar jî li gorî ku dizanin çêkirin. Em ê bi hev re vê hêzê jî derbas bik

## Xêzkarê girtî bi xêzên xwe bal kişand ser şideta li ser jinê




Xêzkar Mehmet Bogatekîn ku di Girtîgeha Tîpa T1 a Kandirayê ya Tirkiyê de ye, bi xêzeke xwe bal kişand ser zêdebûna şideta li ser jinê.

Xêzkar Mehmet Bogatekîn ku di Girtîgeha Tîpa T1 a Kandirayê de ye, bi xêzeke xwe bal kişand ser zêdebûna şideta li ser jina. Bogatekînê ku di mijarên siyasî de piraniya xêzên wî bi kurdî ne, heta niha gelek xêzên wî ji hêla rêveberiya girtîgehê ve hatine qedexekirin û girtîgehê nehiştiye bişîne derve. Rêveberiya girtîgehê pirtûka “Dûvarlari Delen Çizgîler” ku ji berhemên 22 girtiyan pêk tê û yek ji van girtiyan jî Bogatekîn e, nedaye Bogatekîn. Girtîgehê ji bo pirtûkê gotiye “qedexeye” û nedaye Bogatekîn.

## Li dijî vîrûsa koronayê jin di refên herî pêş de ne

Li Afrîkayê, di têkoşîna li dijî pandemiya vîrûsa koronayê de doktor û hemşîreyên jin di refên herî pêş de ne.
Çapemeniya Afrîkayê bal kişand ser têkoşîna doktor, hemşîre û wezîrên tenduristiyê yên jin ên li dijî pandemiya vîrûsa koronayê.
Li Ûgandayê hemşîreya bi navê Dorîs Okûdînîa 11’ê Nîsanê nexweşek bi kursiya nexweşan ji navenda tenduristiyê ya Edîofe bir nexweşxaneya Arûa ku bi 2 kîlometreyan dûr bû. Dîmenê vê yekê di medya dîjîtal de li tevahiya welêt bû rojev. Piştî ku ambûlans nehat, hemşîre Dorîs ji nexweş pirsî “Hûn destûrê didin ku we bi kursiyê bibim?” û bi meşê bi 2 kîlometreyan ew gihand nexweşxaneyê. Ev hewldana Okûdînîa di çapemeniya Ûgandayê de bû rojev.
Wezîrê Tenduristiyê yê Ûgandayê jî li ser hesabê Twîtterê wiha nivîsî, “Dorîs bi rastî jî lehengek e û xebatkarên tenduristiyê hemûyan bi rêzdarî bi bîr tînim. Ew her roj jiyana xwe feda dikin û jiyana bi hezaran mirovî rizgar dikin.”

**ARTÊŞA JINAN A LI ETIYOPYAYÊ DI REFÊN HERÎ PÊŞ DE NE**

Li Etiyopyayê jî stratejiya têkoşîna li dijî vîrûsa koronayê bi profesyonelên sektora tenduristiyê ve hatiye girêdan. Ji bajarên mezin heta bi gundên biçûk ên herî dûr û di karantînayê de, ji bo xizmeta tenduristiyê bikin, ji bo bi nexweşên bi vîrûsa Covîd-19 re eleqedar bibin, ji bo pirsgirêkên hîjyenê çareser bikin û agahiyên rast têkildarî mijarê li nava gel belav bikin, 40 hezar jinên li sektora tenduristiyê dixebitin, seferber bûne.
Wezîra Tenduristiyê ya Etiyopyayê Temesgen Ayehû got, “Ev yek tevneke baweriyê ye ku jinan di nava salan de ava kirine û dike ku em zûtir xwe bigihînin civakê.”

**LI MISRÊ XETA SÊYEMÎN A PARASTINÊ**

Li Misrê jî Konseya Jinan a Neteweyî di destpêka meha Nîsanê de doktor û hemşîreyên jin bi bîr anî. Konseyê têkoşîna jinan a li dijî vîrûsa koronayê û pêvajoya şoreşê şiband hev.

**LI 13 WELATÊN AFRÎKAYÊ WEZÎRÊN TENDURISTIYÊ JIN IN**

Capîtal FM ku li Kenyayê weşanê dike ragihand, li 13 welatên parzemîna Efrîkayê wezîrên tenduristiyê jin in. Li Angola, Bûrkîna Faso, Kongo, Misir, Erître, Etiyopya, Eswatînî, Gîne Bîssaû, Lîberya, Mozambîk, Somalî, Tanzanya û Ûgandayê wezîrên tenduristiyê jin in.
Di çapemeniyê de tê destnîşankirin, li welatên ku ji aliyê jinan ve tên birêvebirin, têkoşîna li dijî pandemiyê hîn bi rêk û pêk û rêxistinkirî tê meşandin.


# Arêz Ebdullah: Di dema şerê DAIŞ'ê de me hewara xwe gihand Qendîlê

Endamê Serkirdayetiya YNK'ê Arêz Ebdullah di hesabê xwe yê Facebook'ê de nivîsek belav kir û tê de wiha got; "Di dema şerê DAIŞ'ê de em çûn Qendîlê û me daxwazî kir hêzên gerîla ji bo Kerkûk, Hewlêr û deşta Nînowa werin şandin. Divê em ewqas kor û bênanûxwê nebin."

Endamê Serkirdayetiya YNK'ê Arêz Ebdullah têkildarê aloziya li Zînî Wertê, nivîsek bi sernava 'Qendîl' di hesabê xwe yê Facebook'ê de belavkir.
Ebdullah di nivîsa xwe de wiha dibêje, "Dema çeteyên DAIŞ'ê Mexmûrê girtin, metirsî ket ser Hewlêrê. Hikûmeta Herêmê ne tenê ji piştgiriya Tirkiyeyê bê hêvî bû, di heman demê de fam kir ku Tirkiye piştgiriya DAIŞ'ê dike. Ji bona wê me berê xwe da Qendîlê û li wir biyar hate dayîn hêza gerîla ji bo Kerkûk, Hewlêr û deşta Ninowayê werin şandin."
Di dirêjiya nivîsa xwe de Ebdullah wiha dibêje "Wê rojê Qendîl amade bû parastina xaka Kurdistan û Hikûmeta Herêmê jî bike. Pişt re hevpeyman li hawara me hat û me bi sipasî diyar kir ku pêwîstî bi Qendîlê nema. Ez carê evqasî bîr tînim, ji bona wê divê em ewqas kor û bênanûxwê nebin."



QASIM ENGÎN



## Her malek akademiyek

Malûm e di milekê de belaya cîhanê Korona di milê din de jî Korona me Kurdan ango Dewleta Tirk bi serokkomar û cêwiyê xwe yê dîn û har.
Giştî cîhan xwe tecrît ango îzole dike. Û wisa dixuye ku ev rewş wê hê demeke din jî devam bike.
Bêguman e ku di rewşên wiha xeternak de encex mirov dikarin bi hevkariyê, bi parevekirinê, bi hevdûgirtinê ango bi alikariye bêhesab bi hevre derbas bikin.
Rastî jî cihê kefxweşiye ku çi gelê me çi jî rêxistinên gelê me vê bi xûrtî û bi coşek mezin dimeşînin. Hîç gumanek nîne ku ev rewşa serbilindî bi xûrtî jî yê were domandin.
Mijareke din a girîng jî ew e ku ji ber nexweşiya bêyom bi mîlyonan mirovên me neçar in ku di malên xwe de bimînin. Ji ber ku em nikarin derkevin derve hê zêdetir wextê me heye ku em li ser hinek kêm û kurtiyên xwe yên ku bi salan me taloq kirine bisekinin.
Di dîroka Kurdan de mijara ku dijminên Kurdan her tim hedef kirine xebatên wan ê mêjî û rewşenbîrî bûye. Ji bona wê jî ger were pirsîn, gelo pirsgirêka Kurdan a sereke çi ye, bersiva ku hîç bêdudilî were dayîn wê bibe zîhniyet ango hişmendî.
Mijara ku Kurd herî zêde hatine felçkirine hişmendiye. Ji ber ku kîjan serdest û dagirker li ser vê axê derbas bûye, ewil hişmendiya Kurdan ji xwe re kiriye armanç.
Hê beriya 2572 salan serdestên Farisan erîşek gelek mezin birine ser Muxên Zerdeşt ango Mêjiyên Zerdeşt yên ku ji bo Kurdan rêvebertî, rewşenbîrtî û peşengtiya oldarî kirine. Hê di wan salan de tam 70 hezar Mux di rojekê de hatibûn katlkirin. Bi gotinek din bi vê erîşê Kurdên ku heta wê rojê yê xwe bûn, di demek şûn de bûbûn yê dijminên xwe. Kurdên ku heta wê rojê di hemû xebatan de ê xwebûn bibûn leşkerên nemir ê Darîus. Û dîroka pê wê jî heta îro tê zanîn e. em hîç behsa dibistanên aşîran ên Osmaniyan nekin. Em qedexeyan Tirkan û hêzên dîtir yên mêtinger jî nekin. Hemûyan ewil li mêjiyê Kurdan dane.
Ji bo ev rewş were derbaskirin Rêber Apo herî zêde mijara perwerdeyê da pêş. Di dema xwe de Lenîn gotibû; rêxistin, rêxistin, rêxistin. Lê Rêber Apo jî diêje; perwerde, perwerde, perwerde. Ji ber vê jî di notên xwe yên Îmralî de nakokiya di navberê hevalên xwe û xwe de mijara; hişmendî û îrade bi lêvkirîbû. Ev rexne jibo kesên ku her sal perwerde dibînin hatibû gotin.
Eger em careke din werin Vîrûsa Corona. Bi sed hezaran heta bi mîlyonan Kurd di malên xwe de ne. Vê rewşê pêwîste ku her Kurdek ji bo ku bikaribe têkoşîna xwe hêna xûrtir bimeşîne, binirxîne.
Kêm û kurtiyên me yên hişmendî yên ku bi salan me taloqkirine em dikarin bi vê bonê derbas bikin. Di malên xwe de li ser esasa ku em xwe bi hişmendiya Rêber Apo bi nûve avabikin, çi bi komî çi jî bi takekesî pêwîste ku em xwe perwerde bikin. Parêznameyên Rêber Apo jibo vê rewşa kambax tam dermanin. Bi xwendin û guftogoyên ku li ser werin meşandin, em dikarin bi nûve xwe biafrînin.
Em dizanin ku tevahî dahûrandin û parêznameyên Rêber Apo ji bo avakirina kesatiyek serbixwe û azad in. Tevahî dahûrandinên xwe jî dijî sekna koletî û stûxwariyê ne.
Bi heviya ku, em xwe ji bo sekna azad û serbixwe bi gêhiştina hişmendiyek û vînek bi xûrt xwe perwerde bikin.

## Siko: PDK, ji encamên ambargoya li ser Mexmûrê berpirsyar e



Ebdulkerîm Siko diyar kir ku PDK û hikumeta Iraqê ji encamên ambargoya li ser wargeha penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) berpirsyar in û got, "Ambargo xizmeta ajandeyên Tirkiyê û dijminên doza Kurdî dike."
Ji 18'ê Tîrmeha 2019'an ve desthilatdariya "Partiya Demokrat a Kurdistanê- Iraq" ambargoyeke girankirî li ser wargeha penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) daniye. Li derdora 12 hezar penaberî li wargehê dijîn. Ji ber ambargoyê gelek penaber ji karê xwe qut bûne, xwendekar ji zanîngehê hatin dûrxistin, her wiha 3 jinên ducanî zarokên wan ji ber wan çûn.
Li gel belavbûna Koronavîrusê ambargo berdewam e. Ev rewş jiyana zêdeyî hezar welatiyên wargehê yên nexweşiyên korînk bi wan re hene, dixe xeteriyê de ye.
Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê (Partî) Ebdulkerîm Siko li ser vê ambargoyê wi hgot: "Ambargoya li ser wargeha Mexmûrê ne ji nirx û exlaqê kurdatiyê ye. Bi taybetî ku cîhan di rewşeke giran re derbas dibe. Ev siyaset xizmeta dewleta Tirk dike ku dijminê herî mezin ê Kurd û doza Kurd e. Hikumeta Başûrê Kurdistanê û Iraqê berpirsyarên encamên ambargoiyê ne. Ambargo ziyanê dide saziyên hikumeta Başûrê Kurdistanê. Ji ber wê divê hikumeta Başûr li gorî qanûn û biryarên navdewletî yên derbarê penaberan de tev bigere."
Ebdulkerîm Siko diyar kir ku ambargo di serî de ziyanê dide dîrok û têkoşîna Mustefa Barzanî. Siko bang li hikumeta Başûrê Kurdistanê kir ku li yekîtiya Kurdî vegere, ziyanê nede yekitiya neteweyî û xizmeta ajande û dijminên doza Kurd neke.

## 'Tirkiye hewl dide bi riya Yemenê Deryaya Sor kontrol bike'

Mensûr Salih got: "Tirkiye bi riya alavên xwe yên mîna koma Ixwan û komên terorîst, hewl dide aloziyê li Yemenê derxe û bi riya Yemenê Deryaya Sor kontrol bike.
FacebookTwitterWhatsAppTelegram
Cîgirê serokê daîreya ragihandinê ya meclisa demkî ya başûrê Yemenê Mensûr Salih ji ANHA'yê re axivî.
Salih di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Agahiyên dawî yên ku berdevkê Artêşa Niştimanî ya Lîbyayê general Ehmed El-Mismarî eşkere kirine, Tirkiye hewl dide ewlehiya herêmê têk bibe. General Ehmed El-Mismarî eşkere kiribû ku Tirkiye hewl dide bi Ixwanan Yemenê koordîna bike.
Ji bo ku xetertirîn kes ji gelek dewletan bi mûçeyên bilind veguhezîne Yemenê. "
Salih destnîşan kir ku Tirkiye hewl dide cihekê ji xwe re li Kendava Eden û Deryaya Sor çêke û endamên terorîst ji gelek welatan birevîne û veguhêze Yemenê.
Mensûr Salih, got: " Tirkiye girîngiya herêma Kendava Eden û Deryaya Sor ji bo ewlehiya herêmî û navdewletî, her wiha ji bo ewlehî û aboriya cîhanê baş dizane. Ji ber vê yekê îro bi hevkariya hevalbendên xwe li hemberî projeya erebî ya li dijî terorê disekine û ewlehiya herêmê dixe xeteriyê."
Salih destnîşan kir ku başûrî li dijî hêzên teror û tundraw ên desteka xwe ji Qeter û Tirkiyê



digirin, disekinin û li hemberî wan şerekî giran dikin û di vî warî de serkeftinên mezin bidest xistine. "

## 'Dewleta Tirk siyaseta xwe ya li dijî azadiya gelan didomîne



Meclisa Malbatên Şehîdan a Dêrazorê nerazîbûn nîşanî kiryara dewleta Tirk a şandina cenazeyê gerîlayê HPG'ê Egîd Îpek bi riya posteyê ji dayîka wî re da û got, "Dewleta Tirk hê siyaseta xwe ya hovane ya li dijî gelên azadîxwaz didomîne."
Gerîlayê HPG'ê Egîd Îpek sala 2017'an li Dêrsimê di şerê li dijî dagîrkeriya dewleta Tirk de şehîd bû. Dewleta Tirk piştî 3 salan bi riya posteyê cenaze ji malbatê re şand.
Meclisa Malbatên Şehîdan a Dêrazorê bi daxuyaniyekê bertek nîşanî hovîtiya dewleta Tirk a şandina cenaze bi riya posteyê da.
Di daxuyaniyê de sersaxî ji malbata şehîd Egîd Îpek re hat xwest û hat gotin, dewleta Tirk siyaseta xwe ya hovane li dijî gelên azadîxwaz didomîne.
Meclisa Malbatên Şehîdan got, dewleta Tirk xwedî dîrokeke reş û hovane ye, li dijî gelên herêmên dagîr kirîn û hat diyarkirin ku dewleta Tirk derdora 450 salan welatên Ereban dagîr kir, xelkên wan welatan ji bo berjewendiyên xwe yên mêtîngerî kişandin şer, niha jî heman rêbazê bi kar tîne. Li pêşberî çavê dinyayê li Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê sivîl kuştin û koçber kirin û guhertina demogarafî pêk tîne."



# Rastî eşkere dibe.."Pêşmergeyên Roj" li Zînî Wertê çi dikin?

Ji bo parastina gelê Kurd "Pêşmerge hatin" ev durişmên bi vî awayî li ser dîwarên bajarê Dêrikê hatin xêzkirin. Lê rastiya wan roj bi roj eşkere dibe. Piştî êrîşên ser Xanesorê, ev koma behsa mijarê êdî ber bi Qendîlê ve diçe da ku bi riya hin partiyên li Başurê Kurdistanê planên Tirkiyê pêk bînin.



Ji destpêka şoreşa Sûriyê ve gelek axaftin li ser "Pêşmergeyên Roj" dihatin kirin. Herwiha hin serokên partiyên siyasî yên li Rojava li ser ekranan derdiketin û îdia dikirin ku ev hêz ji bo parastina gelê Kurd ê Rojava hatiye avakirin. Lê kesên ku ev axaftin dikirin dawî di kampên penamberan ên Ewropayê de derketin. Ev kom tevî ku gelekî nêzî Şingalê bû, Kurdên Êzîdî ji êrîşên qirkirinê yên DAIŞ'ê neparastin.
Niha jî bi derketina aloziya li herêma Zînî Wertê ya li Başûrê Kurdistanê re, careke din navê vê koma çekdar ket rojevê. Herî dawî di sala 2017'an de dema êrîşên Kurdên li ser navçeya Xanesorê ya Şingalê kiribû, derketibû pêş. Gelo ev koma çekdar kî ne, girêdayî kê ye, armancên wê çi ne û çi bi serê gelê Kurd anî ne?

**DAMEZIRANDINA "PÊŞMERGEYÊN ROJ"**

Koma çekdar a ku navê qaşo Pêşmergeyên Roj li xwe dike, li ser daxwaziya serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Mesûd Barzanî ku wê demê serokê herêma Başûrê Kurdistanê bû, hat avakirin.
Ev kom ji xelkên Rojava yên ku bi destpêka şoreşa Sûriyê re penaberî Başurê Kurdistanê bûn, pêk tê. PDK'ê ji bo pêkanîna plan û armancên xwe yên li Rojava penaber bi çek kirin.
Endamên komê perwerdeyên leşkerî ji aliyê pisporên MİT (Milli Istıhbarat Teşkilatı) ve li baregehên xwe yên li herêma Başûrê Kurdistanê ve dîtin û navê "Pêşmergeyên Roj an jî Leşkerên Roj" li wan kirin. Encumena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) ku beşek ji Koalîsyona Niştimanî ya Sûriyê ye ku navenda wê li Stenbolê ye piştgirî da vê komê. Wezareta Pêşmerge ya li herêma Başûrê Kurdistanê îdia dike ku ev kom ne girêdayî wê ye. Lê di rastiyê de girêdayê hêzên Zêrevan ên girêdayî Wezareta Pêşmergeyan in.
Koma çekdar ji 3 tûgayan pêk tê. Hejmara wan tam nayê zanîn, lê li gorî hin ragihandinan derdora 3 hezar kes in. Tê gotin piraniya endamên "Pêşmergeyên Roj" welatiyên Rojava ne, yên ku ji hêzên hikûmeta Sûriyê vekişiyane û penaberî Başûrê Kurdistanê bûne.
Koma çekdar a behsa mijarê li herêmên sînorê bi Rojava- Bakur û Rojhilatê Sûriyê re, herî zêde li herêma Eyn Iweyiz bi cih bûne.

**SEROKWEZÎRÊ TIRKIYÊ SERDANA WAN DIKE**

Di 22'yê Mijdara 2014'an de serokwezîrê Tirkiyê yê wê demê Ehmed Davutoglu li baregeheke wan a perwerdeyê ya li başûrê Kurdistanê serdana "Pêşmergeyên Roj" kir. Wê demê Davutoglu ji aliyê efserên MİT'ê û yên Pêşmergeyên Başûrê Kurdistanê ve hate pêşwazîkirin. Davutoglu derçûna beşa yekem a vê koma çekdar li baregeha Diyana ya li Başûrê Kurdistanê bi rêve bir. Malpera " HABERLER.COM" û Ajansa DHA'yê weşandibû. Ev yek dide diyarkirin û îsbat dike ku ev kom girêdayî kijan aliyan in.
Tirkiye hewl dide êrişî çiyayê Qendîlê bike, hewl dide hêzên PDK an "Pêşmerteyên Roj" di vê plana xwe de bi kar bîne. Da ku Kurdan li hemberî hev rake û destkeftiyên li Rojava û Başûr têk bibe.
Pirsa ku dimîne ev e; Dê PDK an "Pêşmergeyên Roj" di pêkanîna planên Tirkiyê de dewam bikin, an dê berjewendiyên Kurdî yên giştî di ser berjewendiyên partiyekî yên teng de bigire?

## Şêx Baqî: Êrîşa ser Mexmûrê destpêka komployek nû ye

Cemal Şêx Baqî got, "Dewleta Tirk bi hevkariya hinek aliyên başûrê Kurdistanê hewl dide çiyayên Kurdistanê dorpêç bike û tevahiya rêyên wê qut bike. Êrîşa ser wargeha Mexmûr destpêka komployek nû li dijî gelê Kurd li tevahiya Kurdistanê ye."
Sekreterê giştî yê Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê Cemal Şêx Baqî, girêdayî hedefgirtina balafirên şer ên Tirkiyê wargeha Mexmûr (Rustem Cûdî), li gel bêdengiya hikumeta başûrê Kurdistanê ji ANHA'yê re axivî.
Şêx Baqî di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Wargeha Şehîd Rustem Cûdî ya ku bi navê wargeha Mexmur tê naskirin, ji bo du aliyan wek sembolek tê nasîn. Aliyek hewl dide vê wargehê ji holê rake û li aliyê din jî berxwedaneke mezin heye. Wargeha Mexmûrê dema dewleta Tirk bi top û tankan êrişî bakurê Kurdistanê kir, hate avakirin. Di wê demê de şêniyên bakurê Kurdistanê ber bi başûr ve koçber bûn da ku xwe ji êrişên Tirk biparêzin. UN ew wargeh ji penaberên Kurd ên ku ji zluma dewleta Tirk revîne re diyar kir."
Şêx Baqî di berdewama gotinên xwe de wiha axivî: "Dewleta Tirk hertim hewl dide êrişî wargehê bike, ji ber ku wê wek sembola berxwedana gelê bakurê Kurdistanê dihesbîne. Êrişa dawîn jî girêdayî heman warî ye. Mixabin di encama berjewendiyên teng ên hinek aliyên başûrê Kurdistanê de, ew alî derbasî nav planên Tirkiyê bûn û li dijî gelê xwe li wargeha Mexmur xizmeta Tirkiyê dikin."
Girêdayî helwesta hikumetên Iraqê û başûrê Kurdistanê ji êrişên Tirkiyê Şêx Baqî got, "Balafirên Tirkiyê penaberên sivîl di nava kampê de bombebaran kirin. Di encamê de hejmarek ji wan şehîd bûn. Diviyabû hikumeta Iraq û başûrê Kurdistanê bertekek cidî nîşan bidana lê mixabin ti deng ji wan derneket.

## Paşroj avakirina civakeke demokratîk e



Zekî BEDRAN

Dewlet-netewe dijwariyeke pir xerab ya desthilatdariyê derdixe holê. Desthilatdar dixwazin civakê tevê bixin nava pencên xwe û hikum li jiyanê tevbê bikin. Dewlet amûreke desthilatdariyê ye. Di rengên dewletên din de jî desthilatdarî û serdestî hebûnên girîng in. Lê dewlet-netewe di asta herî jor de vê dike. Bi taybetî rejimên faşîst, otorîter û despotîk dixebitin ku civak nikaribin nefesê bistînin. Almanyaya Hîtler, Iraqa Seddam û Tirkiyeya Erdogan mînakên van yên herî berbiçav in.
Dema em werin ser Sûriyê emê bibînin ku rewş ne cudatir e. Tê zanîn ku dewlet bûye tevneke istixbaratê. Saziya dewletê ya herî bibandor istixbarat e. Destûra tevgerên demokratîk nade. Nahêle sazî û partî bibandor bibin. Di qanûnan de çiqas mafê avakirina partiyan hebe jî di pratîkê de nikarin vî mafî bi kar bînin. Partiyên tên avakirin jî tev şeklî ne. Li ti welatên demokratîk partiyek, yan serokdewletek nikare ji sedî not yan not û pêncê dengan bistîne. Civakeke wisa yekkere û tercîheke siyasî nabe. Enceq li deverên partiyên weke Beesê lê bin bibe. Eger em bala xwe bidinê li welatekî weke Tirkiyê, Erdogan digel ku bi partiyeke faşîst ya weke MHPê re itifaq kiriye, enceq ji sedî pênciyê dengan digire. Di ser de digel ku ragihandin tev xistiye destê xwe û derfetên dewletê tevan bi kar tîne. Zordestî, teror û rewşa şer her tim zindî dihêle. Welat di nava krîzê de digire. Digel vê nikare ji sedî heştê yan notê dengan bistîne. Lewre li Tirkiyê digel van kêşeyan û zordestyê ji salên 1950 pêve derbasî sîstemeke pirpartî bûye. Vê rewşê çandek afirandiye. Sûriye ket nava şerekî pir giran. Beşeke girîng ya welat di binê dagîrkeriya Tirkan de ye. Weke din herêmên bi têkoşîna Kurdên li Sûriyê, Asûrî û Ereban ya ji DAIŞê hatîn paqijkirin hene. Li van herêman rêveberiyên xweser hatine avakirin û bi sîstema meclisan modela rêveberiyeke demokratîk tê ceribandin. Di rewşa heyî de li Sûriyê herêma herî demokratîk ev herêm e. Di heman demê de ji bo tevayiya Rojhilata Navî jî li beriyê nûnertiya mînakeke demokratîk dike. Diviya rêveberiya Şamê ji ber nexweşiya koronavîrûsê bi rêveberiyên vir û gelan re bernameyeke çalakiyan çêke. Lewre yên li van herêman dijîn jî welatiyên Sûriyê ne. Ka derfetên Şamê hene yan nînin ew ne girîng e. Ya girîng hişmendî û helwest e.
Pratîk û hişmendiya Şamê wiha ye: "Eger tu desthilatdariya min qebûl bikî ezê bi te re elaqedar bibim, eger qebûl nekî li hemberî te ti berpirsiyariya min nîne, çi were serê te karê min pê nîne." Desthilatdarî di ser her nirxî re tê girtin. Hişmendiyeke evqas tûj û selahiyet kirîn navendî serdest e. Ji bo ku desthilatdariya xwe bide qebûlkirin xwe ji şer û dijwariyê dûr naxe. Ji bo ku stû bide xwarkirin û desthilatdariya xwe bide qebûlkirin, li keysê digere.
Li Idlibê ka wê kêşe çawa çareser bibe tam nayê zanîn. Dewleta Tir hêzeke mezin biriye wir. Dixwaze rêxistinên weke El-Nusra bide rewakirin û tevlî "Artêşa Sûrê ya Milî" bike. Li hemberî Şamê artêşeke alternatîf ava dikin. Heta niha El-Nusra ev proje qebûl nekiriye. Ji Libya heta Yemenê Tirkiye dixwaze li dewletên bipirsgirêk û lewaz bûyîn tevan hikum bike. Ixwaniyan birêxistin dike û di nava vî karî de weke hespê Truva bi kar tîne. Ji bo herêmê tevê Tirkiye bûye xetereke mezin. Ji bo rakirina vê xeterê divê gelên Sûriyê bi hêzên din yên Rojhilata Navî re di nava hevkariyê de be û yekîtiyên demokratîk ava bikin. Lêbelê di pratîkê de tişta dibe ne ew e. Şam jî di navê de dewletên din jî berî her tiştî bi hişmendiya desthilatdariya navenî nêzîkî gelan dibin.
Li şûna ku ji bo avakirina rejimên pir navendî yan jî girtina li ser piyan evqas kêferat bê kirin û derfet bên tinekirin, pêşiya demokrasiyê bê vekirin wê herkes rihet bibe û pirsgirk hêsantir çareser bibin. Rêveberiyên pir navendî karê derstilatdariyê hêsan nakin. Eger erk bên parvekirin, rêveberiyên herêman bên xurtkirin wê barê navendê sivik bibe û ev welat jî rihet bibin. Wê civak zindî bibe û hêz û afrîneriyê gelan derkeve meydanê. Çawa ku tê dîtin pirsgirêk di vir de ye. Rêvebriyên navendî ditirsin, dibêjin eger gel zana bibe û xwe birêxistin bike wê desthilatdarî ji destê me derkeve. Wê demê hişmendiya "Em zor û qedexeyan pirtir bikin û civakê biperçiqînin" xurt dibe. Lê ev hişmendî û rêveberî pirsgirêkan ji holê ranake û nikare heta qiyametê civakan di nava qalbên dixwaze de bigire. Eger bikariya bigire nediketin vê rewşê. Eger Tirkiyê bi inkar, imha û zordestiyê encam bi dest bixista wê kêşeya kurdî neketibûya rojeva wê.
Çawa ku tê dîtin çareseriya pirsgirêkan bi xurtkirina navenê û desthilatdariya yekdest nabe. Tersê wê van nakokiyan kûrtir û girantir dike. Çareserî di demokrasî û pêşxistina azadiyan re derbas dibe. Divê partî, rêxistin, rewşenbîr û kesên diperçiqin daxwaziyên xwe yên azadiyê xurt bikin û ji bo rêxistikirina civakeke demokratîk bikevin nava tevgerê. Gel û kesên diperçiqin, enceq di nava rêveberî û civakeke demokratîk bikarin hebûna xwe biparêzin û bi bawerî û nasnameyên xwe bijîn.